



HEJMAR

SAL 3, 2024

LEWerger

Kovara Wergera Helbestê Ya Çarmehane
Gulan - Pûşper - Tîrmeh - Tebax

Institut kurde de Paris



Pêşgotin

Silav xwendevanên hêja,

LEWerger bi hejmara xwe ya 6em li pêşberî we ye. Çi xweş ku bi hejmara 6em re, kovara me wekî hejmar 2 salên xwe diqedîne. Serê meha rezber/îlonê, ango bi hejmara 7em re, wekî wext jî û wekî hejmar jî wê LEWerger daxilî sala 3em bibe. Wekî do û pêr, wê LEWerger a niha jî û sibê jî her bo givirîn, geşedan û pêşketina wergera helbesta dinyayê di kurdî de û bo berfirehkirina berdî û asoyên helbesta kurdî bi hewl û kedeke jidyayîtir li ber xwe bide, wê derava xwe li xwe xweştir bike û guman jê tune ku wê çêtir bibe çavnasê vê rêya zirav û dirêj...

Me di sêrî de çi rê dabû ber xwe û niha em gihane ku? Di van 2 salên borî de me çi kir, çi bi ser çi ve anî û çi çî qasî pêk hat? Ango divê di dahatûyê de em çi bikin?

Pirsên wereng her hiş û mejiyê me tev didin, me zindî dihêlin, dikin ku em wêrektir bihura xwe qam bikin û bêtir li wêdetirê sor bibin.

Ji we ve jî eyan e ku heya niha ji dehan zimanan wergerên bi dehan nivîskar û helbestkaran bi destê ewledên kurd bûne milkê zimanê me. Aşkere ye ku ewledên kurd êdî xwediyê awirvedan û werbêjiyêke têra xwe zexm û nişmîtir in. Îro û êdî xort û zarokên kurdan ji do çêtir dikarin ji wêjeya cihanê tekstên baş bi wergerên rast, pak û paqij ji çavkaniyên resen bixwînin, xwe pê bi pêş ve bibin û li hawirdora xwe belav bikin. Helbet ev ewledên kurd ne xîretkêşên yekem in ku vî karî dikin, lê û belê! em dikarin bêjin ku di roja îroyîn de bi ruh û can, li hemberî hemû xweşî û nexweşiyên ew ji wan kes in ku tenê bi keda xwe û bi xemeke temam (û beyî qerepere!) di ta û mitaleya zimanê xwe de ne; bo wê seferî û seferber in...

Ta niha bi awayê fermî LEW li ser navê PirtûkaKurdî derdiket, ji niha pê ve wê bi awayê fermî çend hejmar li ser navê Weşanên NAYê derbiçe û ta hingê jî em ê jê re binaxeyêke dîtir î mayînde deynin. Bo ta niha em spasiya PirtûkaKurdî û bo ji vir pê ve jî em spasiya Weşanên NAYê dikin.

Û adar... Bi adarê re ne tenê xweza xemilî û ne hew bihar hat, na! Gelê me yê beşerxweş dîsa gurr kir agirê azadiyê û ruh bi me ve hat; li welat û li derî welat... Silav li seranserî welêt û xaseten jî silav li gelê me yê Wanê...

Hasil, wext her wexta dîtina serkeftin û geşedana berdewam a di warê kurdî de ye. Ev kovar jî mînak û mestereyek e ji vê geşedanê.

Fermo, tev li serkeftin û pêşketina zimanê xwe bibin. Ev ziman û ev kovar a we ye:

Bixwînim û bidin xwendin.

Bimînin bi xêr û xwendinê



Kovara Wergera Helbestê Ya Çarmehane:
Gulan - Pûşper - Tîrmeh - Tebax
Sal 3, Hejmar 6, 2024

Lijneya Weşanê
Yeşîn h., Miradê Miradan, Berfîn Huseynî

Edîtorên Vê Hejmarê
Yeşîn h., Samî Hêzil, Salih Agîr Qoserî, Ciwan Qado, Seyîdxan Kurij
Mizgîn Savci, Azad Rêbiwar, Jiyar Homer, Alan Hemo, Micho Weis

Redaksiyon
Kurmançî: **Yeşîn h., Berfîn Huseynî, Miradê Miradan**
Xwendina dawîn: **Osman Bozkurt**
Kirmanckî: **Seyîdxan Kurij**
Soranî: **Besam Mistefa**

Grafîk
Sadik Hangül
juji tasarim (jujitasarim@gmail.com)

Pêwendî
Instagram: **@lewerger_**
Twitter: **@lewerger_**
Facebook: **lew werger**
Mail: **lewwerger@gmail.com**

Çap
Ceylan Matbaa
Maltepe Mah. Davutpaşa Cad. Güven İş Merkezi, No: 83/317-318-319
Zeytinburnu/İSTANBUL **Tel-Faks:** 0212 613 10 79 **Sertifika No:** 40933

Navnîşan
Na & Kil Yayınları
Kitap, Gazete ve Dergi Basım, Yayım Toptan ve Perakende Ticareti.
846 Sk. No: 42 D:1 1. Beyler-Konak-İZMİR,
Mail: nayayinlari@gmail.com **Tel:** 0 507 319 72 85 **Sertifika:** 40001

ISBN: 978-625-6678-06-4

©Lew, 2024/ Hemû mafên naveroka kovarê parastî ne.
Bi tenê nivîskar ji nivîsarên xwe berpirsyar in.

N A V E R O K

Ji Dê bo Law / ji îngilîzî: Azad Rêbiwar..... 4	Xoşim dewîst / le îspaniyewe: Jiyar Homer 35
Ka ji min re tiştêkî xweş bêje / ji îngilîzî: Azad Ekkaş. 5	Hatina Duyem / ji îngilîzî: Micho Weis..... 36
Dua / ji rûsî: Prîskê Mihoyî 6	Xewneke perîşan / ji farisî: Ebas Mûsa 37
Ez xunava derdê te bim? / ji ermenî: Prîskê Mihoyî. 6	Evin piştî evîne / ji îngilîzî: Jaff 38
Ji Kulîlkekê re / ji swêdî: Salih Agir Qoserî 7	Marianne Davidson, 74 salî / ji swêdî:
Zengilê dil / ji fransî: Yeqîn h. 8	Serkan Birûsk..... 41
Pezê nava mijê / ji îngilîzî: Samî Hêzil 9	Min gelek ji wan dît / ji fransî: Îbrahîm Xelil..... 42
Pirtûk / ji bûlgarî: Xurşîd Îlêwî..... 10	Ez bi zimanê cîhanê axivîm / ji holandî:
Rîta û Tivingek / ji erebî: Alan Hemo..... 11	Hebhinarkê 43
Pers / Fariskî ra açarnayox: Newzad Valêrî..... 12	Hesp / ji îspanyolî: Mem Alan 45
Pevketî / ji fransî: Rifat Arya..... 13	Ramedîna li hemberî deryayê / ji galîsyanî:
Erê spas / ji swêdî: Mizgîn Savci 14	Ûrfan Kenî..... 46
Ez dîn dibim / ji ermenî: Vrezh Kosayan 15	“Hêvî” ew tiştê bi perrîk e / ji îngilîzî: Aydin Ekîn ... 47
Wesfîdayîşê Diyalektîkî / Almankî ra açarnayox:	Stran bo bizavkirinê / ji almanî: Yasemîn Acer 48
Seyîdxan Kurij..... 16	Awaza kevir / ji farisî: Ebas Mûsa..... 48
Bo çi dinivîsim? / ji îngilîzî: Yonca Sarsilmaz..... 17	Wekî mirinê / ji ermenî: Seyrana Celad 49
Stêrk / ji swêdî: Anya Mîran 17	Di dema barana zîvîn de / ji îngilîzî: Azad Rêbiwar . 50
Ev şev e / ji almanî: Tengezar Marînî..... 18	Baxçe / ji fransî: Kevokê..... 51
Biryar / ji rûsî: Karîna Osêyan 18	Baxçe / ji fransî: Yeqîn h..... 51
Axa tu kesî / ji îspanyolî: Jiyar Homer 19	Qereçiyê sernixumandî / ji erebî: Cansoz Dabo..... 52
Evîna têrnebûyî / ji almanî: Nûwar 20	Dara Axlemûrê / ji almanî: Hoşeng Nizarî 53
Şev / ji îtalî: Selîm Nalî Gulfiraz 21	Lê belê belkî / ji almanî: Asya Xerzan 54
Heft Haîkû / ji îngilîzî: Sîdîq Gorîcan..... 22	Du kes bûn / ji erebî: Rizoyê Xerzî..... 55
Piştî ku çavên min bûn du cewherên zela, min ew ji xwe xistin / ji erebî: Ciwan Qado 24	Ez dixwazim werim malê hambêza te / ji norwecî:
Name / ji îngilîzî: Rizgar Elegez 25	Salih Agir Qoserî..... 56
Ji George Sand re l / ji fransî: Hekîm Batî..... 26	Kwêrêk / le îspaniyewe: Jiyar Homer..... 57
cîlweya saqî / ji farisî: Sînan Gavgûr 27	Sê pîfdankên sabûnê / ji almanî: Ciwan Qado..... 59
Çend parçe helbest / ji erebî: Besam Mistefa 29	Ez şev im / ji almanî: Tengezar Marînî 60
Nêrgiz / le swêdiyewe: Bawar Breinholt..... 30	Bihar / ji almanî: Nûwar..... 61
Rîta / ji erebî: Salih Bozan..... 31	Şêst salan bi şûn de / ji îngilîzî: Azad Ekkaş..... 62
Ji Nava Zeviyar Were Yabo / ji îngilîzî:	Phoenix / ji erebî: Alan Hemo 64
A.Rahman Çelik 33	
Roja te bi şekir be / ji erebî: Diyala Elî..... 34	



Ji Dê bo Law – Mother to Son

Langston Hughes (1901 - 1967)

Erê lawo, ez ê bêjim ji te re:
Jiyan ji bo min ne sêlmeke krîstalî bû.
Bizmar tê de bûn,
Û bi pîj û sîxik bû,
Û texteyên wê ji hev felişîbûn
Û zemîneke şilfîtazi-
hin cî jê bê xalîçe bûn.

Lê dîsa jî tim,
Ez pê ve hildikişiyam,
Û digiham berbanîkên wê,
Û li qorziyên wê min çiv didan xwe,
Û carinan jî rêya min derdiket tariyê
Dera ku ronahî lê tune bû.
Ji ber wilo lawo, li şûn xwe nemeyzîne.
Ji pêlikan venekişe
Lewra wê ev ji te re tişteki sext be.
Niha qet nefesîkile-
Lewra hê jî ez pê ve me delalê min,
Hê jî pê ve hildikişim
Û jiyan ji bo min ne sêlmeke krîstalî bû.

Wergera ji îngilîzî: Azad Rêbiwar





Ka ji min re tişteki xweş bêje - Tell me something good

Ocean Vuong

Va ye dîsa tu li zeviya mayînan sekiniyî.

Kesekî ku êdî miriye ji te re gotibû ku a li vir tu yê hînî semayê bibî.

Berf e li lêvên te mîna birîneke xwêlêkirî, tu di nava miriniyên xwe de hildipekî, reş î wekî ketina cilan a xwedê.

Destên te birînine biçûk di bê de vedikin.

Tu tişteki çêkirî yî lo. Paşê kirin ku tu zindî bimînî, ango tu kurikê hinekan î.

Ango eger tu çavan vekî, tu yê vegeerî wî xaniyî, di bin wê betañiyê de, ew a ku bi keştîbayine zer deqdeqî.

Dostikê dayika te, serê wî yê kêl, porsor e li dorhêl mîna extereke agirpêketî, dîsa li ber textê te çong vedaye.

Bayekî ji wîskî û perçikên piskuwîta Oreoyê.

Berf di pencerê re datê: de xwelî û ji destaneke biserneketî vegeeriyaye.

Wî destê xwe yê hibir lê rêtiye, datanî ser sînga te. & tu jî li nava zeviya mayînan didî nava semayê-bê keptûleft.

De perdeyên lerizî. Roniya hingivîn li biniya derî. Henaseyên wî. Rûyê wî yê şil î heşîn: zemîn li çerx û feleka tu kesî nazivirê. & tu jî, te divê yek ji te re bêje *Hêy... Hêy, bi ya min semaya te şakar e. Ez bi qurbana yê valsa biçûk bim, heyrano.*

Te divê yek bêje ku evê han giş ji mêj de bû ha.

Û ku şevêkê, pir nêzîk, tu yê pirtûka xwe ya herî berdil tevî demanceya dayê eyar 45 têxî çentakî, û ku penageha herî misoger e her û her fikarên ji serê mirov û bi jor de.

Ku mesele wiha adilane ye -jixwe divê a wiha be- awayê ku destên me pê tehdeyê li me dikin, û dûre dinê dibexşînin me.

Awayê tu dikarî pê ji dinê hez bikî heyani ku tişteki hêjayî hezkirinê tê de nemîne, ji te û pê ve. Paşê tu dikarî rawestî.

Paşê tu dikarî dûr biçî vegeerî têkevî zeviya mayînan a ku mij jê re bûbû dîwar, ciyê ku şîndamara di stû de heyani dakeve sifirê hîn ji te hez dike.

Tu dikarî bi dûr kevî.

Tu dikarî bibî netişt û hîn û hîn henase bikî.

De ji min bawer bik.

Wergera ji îngilîzî: Azad Ekkaş



Dua

Mihail Lermantov (1814-1841)

Li dema jîyanê ye çetin
Li dil diguvêşe melûlî,
Lê dua dirozgeke min
Dihûne ezberiya batinî.

Heye hêzeke xwedêtal
Li nava xet bendên zindî,
Û rewşeke dûr e nediyar
Radixe bîneke ziyaretî.

Û sivik dibe ruhê min,
Qet tune tu şik û minet:
Bawer im, lê dîsa digirîm,
Ez baristan im û serbest...

Wergera ji rûsî: Prîskê Mihoyî

Ez xunava derdê te bim?

Avetik Isahakyan (1875 - 1957)

Ez xunava derdê te bim,
Li çavên te nûrê vedim,
Notîla bayê şeva hênîk,
Ez keziyê te lal vegirim?

Ger dixwazî gula naz bim,
Li ser sînga te gul vedim,
Li berbangê -pencên zêrîn,
Li ser dêmê te biweşim?

Ger dixwazî dar im, kulîlk,
Li bedenê gul û nar kîm,
Sînka tavê, çûka sibehê,
Bêjim, bêjim, lûrî bikim?

Çi dixwazî, ez ê bibim,
Bibim erd, bibim asîman,
Bibim behr, zinar, tav, hîv,
Tenê, bi tenê hez bike ji min.

Wergêra ji ermenî: Prîskê Mihoyî



Ji Kulîlkekê re - Till en Blomma

Johan Ludvik Runeberg (1804 - 1877)

Te xwe nû ji xewê rizgar kir; - çav êdî ne hefsî ne,
ku tu dinêrî, bi kêfxweşiya dilê xwe li cîhanê,
li sorahiya sibehê ku bi ewrên sivik şîn dibe,
di hembêza binefşan de bûka xwe hembêz dike, xwezayî

Li dora te her tişt bêdeng û bêliv e,
dimirin ji şehwetê yên nêzîkî te,
rûmeta veşartî diheje, li ser baskên zêrîn,
ka bibêze kulîlka biçûk, tu dinyayê çi qasî xweş dibînî?

Tu hîna nikarî texmîn bikî, li gel bayê listikê,
li gel pistepista pinpinîkê û hejandina dotira sibehê,
çawa zû diqede rêzgirtina hevalên bi kelecana,
dê bibarin çend hêsirên xemgîn li ser rûkê te.

Û çima Wî neda te, bi qudreta xwe ya ebedî,
bihareke bêdawî bo jiyana te yî bakîr î çiçekî?
û çima tu nabînî vê xapandina ew qasî şêrîn,
li hemberî tava nîvro ya wekî berbanga rojê?

Îjar bibişire biçûkê ku tu hîn li wir bakîre yî!
Tu yê tavelê bibînî bê bihar çi qasî xayîn e,
û bifikire li ser vê bîstika bextewar,
dema tu di xewnê de yî, di xwençeya girtî de.

Wergera ji swêdî: Salih Agir Qoserî



Zengilê dil - La cloche cœur

Peirre Reverdy (1889 - 1960)

Nayê bihîstîn dengê zengilê ku dizinge
Hewa ewravî ye
Ji ser pêlikên dirêncekê terperepa lingan tê
Kes nakeve hundir
Na! tu kes naxwaze bikevê
Siyek dilerize li wê
Êvar dahatiye pencereyê û malê dişo
Ez î bi tenê me
Û wext wexta payînê
Wext girêdayî demsalê
Kes nema dişê min bêrî bike ji jînê
Nema dixwazim bikevim xewê
Nîn e qîmetê xewnê
Nema dixwazim bizanibim bê ka çi diqewime
Ne bizanibim bê ka diramim yan na
Ne jî bizanibim bê ez kî me

Bi şev dihelin dîwarên spî yên li dora sobê
Kêliya ku pisîkê li beştên ban dinêrî
Wê tu tişt neqewime vê êvarê

Bîra xwe rawestîne
Wê kes neyê te nebîne

Dilê çêtir tepisandî li binê betaniyê dijene
Û têdikoşe bi tena serê xwe
Kî yê bê û bide wî
Birîna wî ya dawî
Ya ku nema şiyar dibe êdî

Wergera ji fransî: Yeqîn h.



Pezê nava mijê - Sheep in Fog

Sylvia Plath (1932 - 1963)

Girik dadikevin nava spîtiyê.

Mirov û stêrk

Li min dinêrin bi awirên xemgîn, qey ez wan didim şermê.

Trên kulmeke hilm e dimîne li paş.

Lo hêdî

Hesp lewitî bi rengê jengê,

Simên lêvşor, çingîna zengilên zîz

Sibe ye lê

Sibe jî reştarî dibe,

Kulîlkekê xatirê xwe xwast carekê.

Hestiyên min req bûne,

Zeviyên dûr dil û hinavê min dihelînin.

Gefan li min dixwin

Berê min didin bihuşteke

Bê stêrk û bê bav, aveke reş û tarî.

Wergera ji îngilîzî: **Samî Hêzil**



Pirtûk - Книга- Книга

Lyubomir Levchev (1935 – 2019)


Ji gotinan we ye ku min xew kiriye.
Pirtûk ji destê min dikeve, mîna balindeyekî ku ji şaxekî cadûkirî bikeve.
Lê ew nakeve erdê
da ku siyê şad neke
ne jî li bihuştê
da ku stêrkan xemgîn neke.

Ez jî êdî nema dixwînim
bi tenê ketime temaşê
bê ka pirtûk çawa ji dest dikeve
û diherike mîna pêşengekî ku di bêgiraniyê de avjeniyê dike
û ji welêt re distirê...
Ew jî dibihîze û dizane.

Û tu jî delalo,
li aliyê din
bi vemirandîna wateyê
dî pistepistê de tu parçe dibî:
- Ma tu tiştêkî din dixwazî?
Şefeqeke din?
Nîvrojeke din? Pirtûkeke din?

- Min divê.
Lê pirtûka bêyî evîn ji çî re ye?
Xelk evînê dixwazin.
Ne nîvî, lê belê tevî dixwazin.
Ku xemgîn jî bin, bêhêvî jî bin
ew evînê dixwazin.
Dixwazim wê bixwînim
dixwazim ta dawiyê wê bixwînim.

Wergera ji bûlgarî: Xurşîd Îlêwî





Rîta û Tivingek

Mehmûd Derwîş (1941 - 2008)

Di navbera Rîta û çavên min de... tiving
Û yê ku Rîta dinase, ditewe û nimêj dike
Bo xwedawendê di çavên hingivînî de!
Û min Rîta ramûsa
Dema ku biçûk bû
Û tê bîra min bê çawa xwe bi min ve girt, û milê min
Nixumand bi xweşiktirîn biskê
Û Rîta tê bîra min
Weku çûk kaniya xwe bi bîr bîne
Axx... Rîta
Di navbera me de ne milyon çivîk û wêne
Û gelek dîdarî
Gulle berdayê... tiving

Navê Rîta di devê min de cejn bû
Laşê Rîta di xwîna min de şahî bû
Û ez bi Rîta wenda bûm... du salan
Û ew li ser milê min raza du salan
Û soza me bû xweşiktirîn peyal, û em şewitîn
Bi şeraba lêvan
Û em ji dayik bûn du caran!
Axx... Rîta
Çi tiştî çavên te ji çavên min diguhertin
Ji bilî du xilmaşiyên
Û ewrên hingivînî
Berî vê tivingê!
Hebû nebû
Hey bêdengiya êvarê
Heyva min î ku li seharê bar kir dûr
Di çavên hingivînî de
Û bajêr
Hemû dengbêj rêj kirin, û Rîta
Di navbera Rîta û çavên min de... tiving

Wergera ji erebî: Alan Hemo



Pers

Furux Ferruzad (1935 - 1967)

Ma bixeyr dî maseyênê... Ma bixeyr dî maseyênê
Ma bixeyr dî sûrênê, keskênê, zerdênê
Vajenê mi ra, gelo odaya krîstalî de
Sey lîlikanê çîmanê merdeyan
Û sey peynîyê şewanê bajarî girewte û bêveng
Şima qet vengê zele nêşnawito
Ke diyarê perîyanê ters û tenayî ra vejîyaynê
Ver bi estunê tuxla yê odaya rakewtîşî
Û lorîyê tik-tikê saetan
Û dendikê şuşeyî yê roşnî ameynê?

Gama ke bieşnawîyayo o veng
Estareyê tacedar asmên ra kewenê erd
Û zerrîyê înanê qîşkek û kaybaz
Bi hîsê bermayîşî şikîyenê û manenê.

Fariskî ra açarnayox: Newzad Valêrî



Institut Kurde de Paris



Pevketî - Correspondances

Charles Baudelaire (1821 - 1867)

Perestgehek e surîşt, ku stûnên wê yên bi giyan,
Gîlî gazinên têkel dizikirînin hinde car.
Tê ve diborin kes, rêleke sîmbolan e ev diyar,
Bîner in her li mirov li gel awirine ne biyan.

Mîna gulbangên kûr, mil didine mil li dûr û derez,
Di zikê tariyê de û di nêv yekîneya kûr de,
Mîna şevê, mîna pertewê, ne tixûb e, ne hed e;
Bêhn û reng û deng, vedigerînin li hev bi cergebez.

Bêhnin hene terr û geş, çawa bêhna canê sebiyan,
Nerm û naz, çawa obûa, wekî çêreya kewşenê şîn
-Û hinên mayî dilrevînok, serkeftî, bi sermiyan.

Wan tiştin hene; ber bi bêdawiye ve digivirin;
Çawa misk û ember û gezo, çawa bêhna darbene
Welê, pêkve distirên li ser koça bîr û boçûnê.

Wergera ji fransî: Rifat Arya



Institutul Kirde de Parîs



Erê spas - Ja tack

Sonja Akesson (1926-1977)

Destekî germ.

Stareke germ.

Xirqeyekî germ

da ku li van ramanên qeşagirtî bikim.

Bedeneke germ

da li bedenê bikim.

Giyaneke germ

da li giyan bikim.

Jiyaneke germ

da ku li vê jiyana qeşagirtî bikim.

Wergera ji swêdî: Mizgîn Savci

Institut kurde de Paris



Ez dîn dibim

Paruyr Sevak (1924-1971)

Yên ku li min guhdar in
Dikarin bêjin,
Dîn bûye çi ye!
Û ez ê bêjim,
Erê, ez dîn bûme,
Çima nehim!

Ma ne bi dînbûnê mirov hez dike û nefret dike?
Ma ne bi dînbûnê textik dikin qirçeqirç?
Bêyî dînbûnê şerê serkeftî nîn e.
Bêyî dînbûnê însanekî nû nayê dinyayê.
Heta av dîn nebe nakele,
Û qaşila hinarê naqelişe.

Dar dikin xişexiş?
Dîn bûne bêşik.
Heke dinya dizîvire,
Dîn bûye bêguman...

Tov heta qenc dîn nebin
Nabine zad.
Tilî heta qenc dîn nebin,
Nabine dest.
Peyv jî heta qenc dîn nebin,
Nabine stran...
Ax xwezî ez her tim dîn bûyama...

Wergera ji ermenî: **Vrezh Kosayan**



Wesfîdayîşê Diyalektîkî - Lob der Dialektik

Bertolt Brecht (1898-1956)

Ewro bêdaletê bi gamanê xo bawer dewam kena.
Zulmkar xo semedê des hezar serrana hedre kenê.
Şidet garantî keno: Her çî sey xo maneno.
Xercî vengê hukumdaran qet yewna veng nêyeno eşnawiten.
Û bazaran de kedwerdî bi yew vengo berz vana:
Ez nika newe dest pê kena.

La nika kesanê bindestan ra zafê înan vanê:
Çîyo ke ma wazenê çî rey nêbeno.
Kam ke hema ciwîyayeno, nêvano - çî rey!
Emnîyetin, emnîyet nê yo.
Her çî sey xo nêmaneno.
Eger hukumdaran qîseykerd
Bindest qîsey bikerê.
Kam cesaret keno vajo: Çî rey?

Eger zulm maneno, sucê kam o? Yê ma yo.
Eger o binkuweno, sucê kam o? Eynî wina, yê ma yo.
Kam ke gîna erd rê, wa warzo!
Kam ke vîndi kerd, şer keno!
Kam ke rewşê xo nas kerd, o senî eşkeno bêro vindarnayen?
Çunke ê ke ewro binkewteyê, ê serkewteyê siba yê.
Û çî rey ra beno: Ewro hema!

Almankî ra açarnayox: Seyîdxan Kurij



Bo çi dinivîsim? - Why I write?

Sylvia Plath (1932 - 1963)

Tu ji min dipirsî bê çima jiyana xwe bi nivîsê diborînim?
Gelo jê kêfê digirim?
Tiştêkî hêja ye qey?
Berî her tiştî pê debara xwe dikim?..
Ger na, hingê çi ye sebeb?

Tenê dinivîsim, ji ber ku
Dengek heye di dilê min da
Ku wê êdî nebile

Wergera ji îngilîzî: Yonca Sarsilmaz



Institut kurde de Paris

Stêrk -Stjarnorna

Edith Irene Sodergran (1892 - 1923)

Wexta şev tê
disekinim li ser derencê û guhdarî dikim,
stêrk dixuricin baxçe
û ez disekinim di tariyê de.
Bibihîze, stêrkek rijiya bi dengvedanekê!
Neçe ser giyayê bi pêyên rût;
baxçeyê min tije parçecam in.

Wergera ji swêdî: Anya Mîran



Ev şev e - Diese Nacht

Nelly Sachs (1891-1970)

Di kolaneke tarî re dimeşiyam
wê hingê, sîbera min,
li goşeyekê,
xwe di hembêza min de
bi cih kiribû
Vî kincê westiyayî
xwest were liberxwekirin
Û reng qet li xweşiya min nehat:
Tu ew hêl î

Wergera ji almanî: Tengezar Marînî

Bîryar

Anna Akhmatova (1889-1966)

Û gotin wekî keviran ket
Ser sînga min a hîn zindî.
Tişt nebe, ji ber ku ez amade bûm
Û ez ê bi awayekî bidebirim.

Îro gelek kar heye ku ez bikim,
Pêwîst e ku hinek bîranîn bikujim,
Pêdivî ye ku giyan bibe kevir,
Û ez dîsa fêrî jiyane bibim.

Lê ne ew e, germahiya havînê
Mîna cejna li pişt pencereya min
Demek dirêj ez li hêviya vê yekê bûm
Rojek ronî û xaniyê vala.

Wergera ji rûsî: Karîna Osêyan




Axa tu kesî

Cristina Peri Rossi (1941-)

A niha ku hemû herêm
dixwazin bibin netewe
ez li axa tu kesî dîgerim
li wî cihê bênav
ku tu kes doza xwedîtîyê lê nake
derbihurkek
mîna lezbihurka jîyanê bi xwe
bêyî niştiman
bêyî ala
bêyî sînor
bêyî zimanê zanavê
zêdetir ji zimanê helbestê.
Xaka xewnan
ew dera ku her tişt lê dest pê dîke
ew dera ku her tişt lê tê vedîtin.

Wergera ji îspanyolî: Jiyar Homer



Institut Kurde de Paris



Evîna têrnebûyî - Nimmersatte Liebe

Eduard Morike (1804-1875)

Wisa ye evîn! Evîn wisa ye!
Bi ramûsanana aş nabe:
Ew kîjan bêhiş e ku dixwaze
Bêjingê bi avê tije bike?
Û tu hezar salan jî avê bikişînî,
Û tu her tim maç bikî jî,
Tu nikarî wê têr bikî.

Evîn, evîn her saet heye
Arezûyên nû yên ecêb;
Heta ku lêv kul bûn me gez kir,
Wexta ku me îro hev maç dikir,
Keçik xweşik bédeng ma,
Mîna berxa bin kêrê;
Çavên wê lava dikirin: Her tim nêz ve bê
Çi qasî bi êş, ew qasî baştir!

Evîn wisa ye! û wisa jî bû,
Heta ku evîn hebe,
Û Nebî Silêmanê jîr,
Di hezkirina xwe de ne cuda bû.

Wergera ji almanî: Nûwar



Institut kurde de Paris



Şev - La notte

Cesare Pavese (1908 – 1950)

Lê şeva bayî, şeva sayî
ya ku bi zorekî tê bîra min, niha dûr e,
bi tenê bîranînek e. Aramiyeke metelmayî li dar e,
ku ji belgan û hîçtiyê pêk hatiye. Tişteke namîne,
ji wê dema ji bîranînan wêdetir, ji bilî bîranîneke xumam.

Car heye li nava rojê vedigere
li ronahiya hêmin a roja havînê,
ew şaşwaziya dûr.

Ji pencereya vekirî
gede dikete temaşeya şeva li ser palên şên û reş,
û metel dima ji dîtina palên bi ser hev de paldayî:
Hêminiya nediyar û çîksayî. Ji nava belgan,
ku li ba dibûn di şevê de, pal dixuyan,
li wir her tiştê li nava rojê, berpala
û dar û rez, gişk kifş û mirî bûn
û jiyana yeka din bû, ji bê, ji asmên,
ji belgan û ji hîçtiyê.

Car heye vedigere
di aramiya hêmin a nava rojê de, bîranîna
wê jiyana heweskar, di wê ronahiya metelmayî de.

(16 avrêl, 1938)

Wergera ji îtalî: Selîm Nalî Gulfiraz



Heft Haîkû

Jack Kerouac (1922-1969)

tipikeke şiliyê
ji serbanê jorê ket
ket nav meya min

trên hê li asoyê
li pencereya li berê me
dibe gurregurr

dersa tu distînî
ev e ji hemî perweriyan —
pêjna bêdengiyê

şevê da ser
lawko pifok berba kirin
bi çovê xwe

şirqînê li tilî xe
dinyayê çik rawestîne —
baran gurrtir tê

li ser kulîlkekê
va ketiye xewê gûstêrik —
min tu find navê

telgrafek ji tune —
ya îro li me heyî
pel pirtir diwerin

Wergera ji îngilîzî: Sidîq Gorîcan





Piştî ku çavên min bûn du cewherên zelal, min ew ji xwe xistin

Colan Hacî

Maleke dî

Mal di pencereya maleke dî de
fena rûyekî tirsonek e.

Ez mala xwe bûm, min ji ava xwe vedixwar
û li ser xewna xwe qurp diketim.

Xerîbekî agir bi hundirê xewê xist
û xwe li ber germ kir,
paşê li ser dîwarên reş
navine tozgirtî kola,
navine ku heya niha jî nikarim wan bixwînim.

Berî min

Li bin qizwana narincî
Keçxamaya me ya nedeynkir,
libek cehê ku belalûkên me birrandîne, zîl dide
û beranê min ê razayî qiloçê xwe yê fetlonekî dihejîne
zengilê min di nava hiriya wî ya hinekirî de dizinge
û li ser nêrdewana dep deng ji çirçirkekê dibile.
Li ser zendên bavê min ên zirav û esmer,
li bin qiyameta stêrkên havînê yên wekî bizirên kuliyan,
dêya min di bayê şîn î tarî re,
bi wî bayê ku li ber şanika bi rengê mewîjan girover bûye,
şanika li jêr guhê wê yê rastê,
destê xwe dide derziyekê
ku ew di şarika xwe ya mûsilî de ji bîr kiriye,
derziyê zîv û şîn fena wê peşka deqa rengvekirî, ya li nêv her du birhên wê yên zirav.
Dûre jî, palika çavê xwe yê xilmaş
bi ser stêrkeke rijiyayî de digire
û xewnekê di xewna xwe de dibîne, dibîne ku ez careke dinê jê re çêdibim.



Xanima destçep

Kî ye ewê ku wê li ber destê sibehê pêrgî min bê û wê xweliya min di deryaya dîn werbike?
Wê niha kî were,
ji bo ku marê girs ê bendewariya min bigurîne?
Wê kîjan deng min bi hiriya xwe ya nerm binixumîne?
Di kilîta zingargirtî re mifteya jiberderxistî dizivire
ji xwe re dibê, tu hatî û ecêbmana min, min di hev werdike
êdî jimara telefona te ya li ser bilêta sînemayê nivîsandî vedişêrim
û bi xwasî berî didim çavika derî
pêjna solekê di tariya pêpelingê de dizinge
ji xwe re dibê, bêhna te hinekî teng bûye, ji ber wilo te rê şaş kir û tu berev min hatî.

Bişkokine qetiyayî diçirisin di pencereya bi baranê xêzkirî re
ji xwe re dibê, zibûnên qehwexaneya barkirî tu revandin
an merivên te yên ziravoçkî tu kuştin
û bi germî xwîna te bi ser kepezan de rijandin.

Ji niha û pê de
tu nema tê, bi saeta xwe ya alarmê ku di hundirê çentê te de diheje,
êdî hew bi pozê sola xwe li biniya deriyê min dixîni.

Şaşîti

Tu di girewê de têkçûyî,
ji destpêkê de tu têkçûyî.
Ne balindeyek bû ruh
ku tu bi qîlên xwe hêka wî bişkîni,
hêka ku sawêra zaroktiyê ew di boriya sobê de sêwî hiştiye.
Ruh ne pinpinîkek bi pûrteke xalxalkî ye
ku her tu dilteng bibî tu nêçîra wê bikî,
ne jî kaxetek e ku tu wê li ser dîwêr zuha bikî,
kengî li serê te bixîne tu wê bi paniya sola xwe biperçiqîni.
Ruh xwîneke bi keser e
ku ax bi sorê tarî û sivikahî pitpitkî kiriye
fena peşkên pêşîn ên ketina cilan.

Wergera ji erebî: Cîwan Qado



Name - The Letters

Louise Gluck (1943 - 2023)

Ji bo cara dawî şev.
Ji bo cara dawî destên te
li ser bedena min têne hev.

Sibê wê bibe payîz.
Em ê rûnên li balkonê tev
temaşeya li belgên hişk
dixîşikin di nava gund ra
mîna nameyên ku em ê bişewitînin,
tenêka, li malên xwe yên cuda.

Şeveke çî qasî bêdeng.
Tenê dengê te dike pistîn
Şil î, dil dikî
û zarok
radizê wekî ji dayik nebûbe.

Sibê wê bibe payîz.
Em ê li baxçeyê piçûk bimeşin bi hev ra
di nava kursiyên kevir û devîyan ra
ku hê di nava sîsê da nixumandî
mîna mobîlyayên zûva jibîrkirî.

Binêre, belg çawa dixîşikin li nava tariyê.
Me şewitand kir xwelî
her tiştên li ser wan hatibûn nivîsîn.

Wergera ji îngilîzî: Rizgar Elegez



Ji George Sand re I - À George Sand I

Alfred de Musset (1810 - 1857)

Va dîsa tu hatî, di şevên min î stêrkî de, ferîşteya bedew a çav şînê deryayî,
palik nixumandî, Yarê! xweşiya min î bala, ya ku min wenda kirî!
Ji min we bû ku ez ê seranserî sê salan, zora te bibim û te nalebar bikim,
Û tu, bi çavên şil, û bi kenê dilovan, li nik textê nivînê min, va dîsa tu hatî.
Erê, ji lêvên te du peyvan, ez kirim padîşahê cîhan,
Destê xwe deyne ser dilê min, ax birîna wî xedar e; Kûr bike vê birînê
ey ferîşteya spehî, û bera di xwînê der bibe! Evîndarekî ku ebed hez nekiriye,
ku li ser dosta xwe nemiriye, ne jî li ser çavine qîr î reş serxweşiya îlahî vexwariye
Û ne eniyeke pir xweşik ku kesî tu carê tu maç nekiriye!

Wergera ji fransî: Hekîm Batî

Institut kurde de Paris



cîlweya saqî

Rehî Mo'ayyerî (1909 - 1968)

ew gul e yan nîgara te ye ku ketiye nava peyalê?
tav e di neynikê de yan agir e ku ketiye nava avê?

meya rûşen demekê ji destê meyger dûr namîne
meh îşev bûye dost û mêvan li cem tavê

bes ku mest e di pêşa min a terr de raketiye ew lalerû
birq jî ji ber ku germ e ketiye paxila ewravê

li pey hewayaya mirovahiyê em bi hîleyan şewitîn
agir bi dilê me girtiye ji ber pêlên serabê

hê derbas nebûbûn rojên zaroktiyê pîrî hat
ji pirtûka emrê me qetîne rûpelên şebabê

asîman mat maye ji ber serkêşiya me
derya noqî fikaran bûye ji ber karên kefavê

goşeya tenêtiyê bûye meskena serbilindiyê Rehî
gencîneyên gewherê peyda dibin li kuncên xerabê

Wergera ji farisî: Sînan Gavidûr



Çend parçe helbest

Selîm Berekat

I

Hejmara wan roj bi roj zêdetir dibû
Ji Taşkentê, ji Xozistanê, Ermenistanê û ji başûr rojavayê Rûsyayê rahiştin cilikên xwe
û buxçikên serxesê û hatin Cizîrê
Bêyî das û pêlav hatin.
Tu biçûk bûyî
Te nizanîbû ku ew hewcedarî avê ne
Te nizanîbû ku ew hewcedarî jineke dîn an jinebî ne ku wê li deverêke dûr di qelşên
berriyan de veşêrin qene di salên koç û koçberiyê de nîsk û sîsirk ji wan qelşan şîn
werin.

II

Di roja 29.06.1971ê de derbasî sala xwe ya sêzdehan bû
Di roja 03.09.1971ê de refek geda li dora xwe kom kir
û berê xwe da deryaçeya nêzîk da bi avê re bizewice.

III

Rûnaştayê
Rûnaştayê
Kevîrek di bin zimanê min de ye
Çûkine tirsîyayî di hînavên min de ne
Ma ez çawa aram bibim hey Rûnaştayê?

IV

Tu
Tîrsa te
Hêsîrên te
û berfa bilindahiyên te
Ma hûn nayên êdî?



V

Du mafên mirov hene
Toz û pîrozweriya tozê
Na, mafekî tenê yê mirov heye: Mirin.

VI

Ji şehîdan re
Ez dilê xwe mîna perperrîkan belawela dikim
Kezeba xwe ber bi hêlînan avê ve dibim
Çûkên Şamê û asîmanê xwe dibim
Di nava hêlînan de direvim
Da ku pêlekê yan paytextekê wergirim
Di nava hêlînan de direvim
Da ku vê kefa erebî ji ser navan rakim.
Her şehîdek vêga dide pêşiya min
û ji şehîdan re
Ez dilê xwe mîna perperrîkan belawela dikim.

Dibêjin: Ev gora wî ye
Dibêjin: Ev jî kêla wî ye
Dibêjin: Ew gulên westiyayî
Û ew çivîkên ku hinekî li ser gorê geriyan -temenê wî ne.

Lê yên ku dizanin
Û kulîlkên ku bi cenazeyê wî re derketin
Û refên hehecikan û ewrên berjorbûyî
Kirin himehim: Na... her gorek gora wî ye!

Wergera ji erebî: Besam Mistefa



Nêrgiz - Narkissos

Ingela Strandberg (1944 -)

Min û Nêrgiz
Le heman tîre bûyn

Maşênekan be helkirawî cê dehêlran û
Ême le qerax zeriyaçekan rodenîştîn
Ta xoman le awêney aweke da bidozînewe
Zayeley henasekanman
Dergekanî şewgarî lêwedekird

Nêrgiz
Take rêgey derbazbûnm bû
Le cîhanî bişêwî

Diwahemîn hengawî
Ew
Bê min helênayewe

Ne kes çîdî çawî pêy kewtewe
Ne min dengim kird

Ger qiseşm bikirdaye
Kiwa birwayan be min dekird

Wergêranî le swêdiyewe: Bawar Breinholt



Rîta

Mehmûd Derwîş (1941 - 2008)

Di navbera çavên min û Rîta de tivingek heye
Ê ku Rîta nas dike, xwe jê re xwar dike
Û nimêjê dike ji Yezdanekî ku di çavên hingivîn de ye.
Gava Rîta biçûk bû min ramûsa
Tê bîra min çawa bi min de qemitî,
Her du zendên min guliyekî bedewtirîn nixumand.
Ez Rîta bi bîr tînim
Çawa çivîkek solîna xwe bi bîr tîne
Ax... Rîta!
Dema milyon çivîk û wêne
û gelek hevdîtin di navbera me de hebûn
Tivingekê qurşîn li wan reşand.
Navê Rîta di devê min de cejnek bû
Gewdeyê Rîta di xwîna min de ahenga bûktiyekê bû
Ez bi Rîta re du salan wenda bûm
Ew li ser zendên min du salan raket
Me li ser peyaleke bedewtirîn soz da,
di inbîta lêvan de em şewitîn
û du caran em peyda bûn.
Ax... Rîta!
Berî vê tivingê çi çavên min ji çavên te dûr xistin
Xeyne du xilmaşan û ewrin hingivîn.
Hebû tune bû,
lê bêdengiya êvarê...!
Hîva min li sibeyê di çavên hingivîn de dûr koçber bû,
Bajêr stranbêj giş damaland û Rîta jî
Di navbera min û çavên Rîta de tivingek heye.

Wergera ji erebî: Salih Bozan



Ji Nava Zeviyên Were Yabo - Come Up from the Fields Father

Walt Whitman (1819-1892)

Ji nava zeviyên were yabo, binêr ji Peteyê me nameyek hat,
Tu jî were deriyê pêşiyê yadê, binêr ji lawê te yê delal nameyek hat.

Binêr, payîz e,
Binêr, li vê derê dar, keskê tarîtir, zertir û sortir in,
Gundên Ohioyê bi pelên li ber bê dikevin hênik û xweş dibin,
Sêvên li ser darên baxçeyên fêkiyan û tiriyên li ser dêliyên mêwan çêbûne,

(Bêhna tiriyên li ser dêliyan tê we?
Bêhna genimên reş ên vê axiriyê vizîna mozan bi ser wan ketiye tê we?)

Li jor, binêr, piştî baranê asîman çî qasî aram, çî qasî zelal, û tije ewrên nuwaze ye,
Li jêr jî, her tişt aram, her tişt jîndar û xweşik e, û çewlik xweş dixebite.

Li jêr, li nava zeviyên her tişt xweş dixebite,
Lê niha ji nava zeviyên were yabo, were dengê qîza xwe,
Û were pêşiya malê yadê, zû were deriyê pêşiyê.

Heta ji dest hat zû kir, tişteki bêyom, gavên wê ricifîn,
Ne ji bona porê xwe û ne ji bona girêdana serê xwe rast bike sekinî.

Mektûbê zû veke,



Ho her çî qasî navê wî li ser e jî, ev ne nivîsa lawê me ye,
Ho destekî xerîb ji bona lawê me yê delal nivîsiye, Ho giyanê yadê parçe kiriye!
Her tişt li ber çavên wê diherike, reş dibe, tenê peyv deng vedidin di guhên wê de,
Hevok ji hev parçe dibin, gulle li sîngê ketiye, di pevçûnê de, rakirin nexweşxaneyê,
Niha hinekî ne baş e, lê belê wê zû baş bibe.

Ax niha qilafetê ez dibînim,
Di nava hemû qerebalix û dewlemendiya hemû bajar û çewlikên Ohioyê de,
Wecekî nexweş ê spî û serekî gêj, bi hejhej,
Xwe spartiyê textê derî.

Xwe neqeherîne, dêya min a delal, (qîza wê ya nûgihîştî bi îskeîsk dibêje,
Xwehên biçûk bêdeng û bi xof li der û dorê digerin.)
Te dît, dêya delal, name dibêje wê Pete zû baş bibe.
Wax lawikê reben, wê tu carî baş nebe, (nexwe pêdiviya wî ruhê wêrek û ji rêzê, bi
başbûnê jî tune ye.)
Wê dema ew li ber deriyê malê sekinibûn ew ji zû de miribû,
Tekane law miribû.

Lê belê dayik divê baş bibe,
Laşê wê yê lawaz êdî xwe li nava reşê dipêça,
Nava rojê xwarîna wê dest pê nedibû, bi şevê kêman caran radiket, hema hema hişyar bû,
Nîvê şevê radibû, dikir îskeîsk, hesreteke kûr dikişand,
Ax xwezî bêyî haya kesî, karîbûya bêdeng ji jiyane bireviya
Bidaya dû lawê xwe yê delal, ew bidîta û piyê xwe bidaya piyê wî.

Wergera ji îngilîzî: A.Rahman Çelîk



Roja te bi şekir be

Nizar Qabbani (1923-1998)

Roja te bi şekir be
Ger rojek çû û min ji bîr kir tê de bibêjim:
Roja te bi şekir be...
Û min mîna tifalekî dest bi nivîsandina
Gotinin xerîb kir li ser rûyê lînûsê
Hîngê ji matmayîn û bêdengiya min aciz nebe
Û qet plan neke ku tişteke hatiye guhertin
Çaxa ku ji te re nebêjim ji te hez dikim..
Tê wê wateyê ku bêtir ji te hez dikim.

Ger rojekê tu hatî ba min
Bi cilekî mîna giyayê golan... Kesk... Kesk
Û porê te bi ser milê te de herbilî
Weku deryayê.. Weku dûrahiyên êvareke belakirî..
Û memikên te.. Berz di bin hejîna şepik de
Mîna derba xencerê.. Xweş e.. xweş e
Min dest pê kir nefesên kûr ji cixareya xwe bikêşim
Û ji hibra efsûniyên xwe têr vexwim û mest bibim
Wê çaxê min bi mirina hestan nepîve
Û nebêje ku dilê min bûye kevir
Di xeyalê de xwedawendekî ji te diafirînim
Û memikên te dikim parçeyek gewher
Û di xeyalê de.. Porê te mîna kufîlkan diçînim
Mîna genim.. Behîvan û daristanên cehterê

Ger tu demeke dirêj li pêşberî min rûnî
Mîna şaneşîneke ji bêhna xweş û mermerê
Û min çavê xwe ji xweşiyên te re girt
Û min gazinekî şepikê bi bêhn paşguh kirin
Plan neke ku ez te nabînim
Ji ber ku hin mijar bi hiş tên dîtin
Di sîtavê de bêhna te bi deng dibe
Û dûrahiyên çavên te firehtir dibin
Ji hezkirinê bi wêdetir ji te hez dikim..
Lê bihêle ez te bibînim weku ez dixwazim

Wergera ji erebî: **Diyala Elî**





Xoşim dewîst

Pablo Neruda (1904 - 1973)

Emşew detwanim xemgîntirîn şî'r binûsim.
Bo wêne, binûsim:
"Şew lêwanlêwî stêrane,
le dûrewe şîn deçinewe û cirîwecirîwyane."
Şewba be asmanewe deşinêtewe û deçîrîkênêt.
Emşew detwanim xemgîntirîn şî'r binûsim.
Xoşim dewîst, ewîş carcere xoşî dewîstim.
Şewanêkî emşewasa le bawesîmda demlawandewe,
le bin asmanî bê binda maçbaranîm dekrîd be 'ezretewe.
Xoşî dewîstim, minîş carcere xoşim dewîst.
Nemdetwanî çawe kall û mengekaniîm xoş newêt.
Emşew detwanim xemgîntirîn şî'r binûsim.
Bîrî bêewiy matî kirdûm. Hestî ledestdanî daygirtûm.
Gwê helldexem bo şewî nebirrawe, bebê ew nebirrawetire.
Hozanekeyişim detkête ser roh; çeşîni awnîgî pelkegyaye.
Be çî deçêt? Xoşewistiyekem neytwanî bihêllêtewe.
Şew lêwanlêwî stêrane û ew legell minda niye.
Ewe hemûştêke. Le dûrewe yekêk deçîrîkênêt. Le dûrewe.
Dillim be beryewe nemawe wa ewî le dest dawe.
Her dellêy lem nizîkaneye, çawm boy hellwedaye.
Dillim boy hellwedaye, keçî ew legell minda niye.
Zirîwey trîfe allawe le bejinî darekan.
Kesîşman çîdî nemawîn ewey caran.
Wa îtir xoşim nawêt, raste, bellam ay çendim xoş dewîst!
Dengim raspêrî sirweye ta xoy le gwêçkey nermunollî hellbîswêt.
Caran hiy maçekanîm bû keçî yekêkî dî. Debête hiy yekêkî dî:
Jêy dengî, leşularî spîwsollî, çawî geş û niyanî.
Wa îtir xoşim nawêt, raste, bellam renga xoşîşim biwêt.
Evin êcgar kurte û lebirçûneweyş êcgar dirêj.
Sa şewanêkî emşewasa le bawesîmda demlawandewe,
Dillim be beryewe nemawe wa ewî le dest dawe.
Eme dwayîn jan û tallawe ew pêy çeştîm,
Emaneyş dwayîn peyivî min boy denûsim.



Wergêranî le îspaniyewe: Jiyar Homer




Hatina Duyem - The Second Coming

William Butler Yeats (1865-1939)

Her dizivire û fireh doş dibe
Baz nikare dengê bazdar bibihîze;
Tişt dipiringin; navend nikare zevt bike;
Tenê xirecir bi ser gerdûnê da dipijiqe,
Kêş û vekêşa xwîna tarî dipijiqe, û li her derê
Dêlindêza bêgunehiyê dixeniqe;
Yên baştir bê bawerî ne, hingê yên pîstir
Bi azweriyeke tîr dagirtî ne.

Helbet hindêk nîşane berdest in;
Helbet Hatina Duyem nêz e.
Hatina Duyem! Bi zorê ev gotin bi lêv dibin
Dema ku wêneyekî berfireh ji Giyanê Gerdûnê
Bînahiya min belav dike: li cihekî di qûmên beyabanê da
Lawirekî bi laşê şêrekî û serê peyayekî,
Awirekî wekî royê vala û bê dilovanî,
Ranên xwe yên lawaz dilivîne, hingê her tiştên wî
Sîberên gulokîn ên balindeyên beyabanê yên tore ne.
Tarîti dîsa xwe vedigire; niha ez dizanim
Ku bîst sedsalên ji xewa kevirin
Bi dergûşeke hejandî behecîn ta şevpestekê,
Çi lawirekî hov e, ewê ku dawiyê dema wî hat,
Û ku berve Bethlehemê dixuşe da ku ji dayik bibe?

Wergera ji îngilîzî: Micho Weis





Xewneke perîşan

Shirin Razavian

Ez ji gera dînîtiyê tēm
êvar û sibehan
bi aqil hişyar dibim
û di nava vê tevliheviya xwe de
tixûbên tenêtiya ebed derbas dikim

Her şev
ew Xwedayê hêzdar
ew helbesta Xwedayî
Xwedayê peyvên dêrîn û îroyîn
min vedixwîne seraya xwe
ez bi xeml û xêz diçim
di nava hevrişîma hêşîn a hîvronê de
serî bi aliyekî de şorbûyî
bi hemû coşa xwe diçim

Ez bi xwe dizanim
ez diçim
hetanî seherê
bi serxweşî pêyên xwe li bin guhê erda hucreya tirsnak didim
û seherê rok ji rojhilat ve hiltê

Xewna do
mîna xewneke perîşan bû
ku bi tenê
qelem û kaxez rastiya wê ne

Wergera ji farisî: Ebas Mûsa



Evîn piştî evînê - Love after love

Derek Walcott (1930 - 2017)


Demek tê
Tê xwe bi dilxweşî pêşwazî bikî
Li ber dergehê xwe, li ber neynika xwe
Her yek ji we wê devliken xêrhatina yê dî bike

Û wê bêje: Kerem bike vir, bixwe
Tê careke dî ji wî xerîbî hez bikî
Ewê ku tu bi xwe yî.
Şerabê bidê, nê nê bidê, dilê xwe vegeirîne
Li wî xerîbê ku ji te hez kirî.

Bi dirêjahiya temenê xwe, te ew hêla bû
Li xatirê yekî dî, yekî ku ji dil te nas dike

Destê xwe biavêje nameyên evînê
yên li ser refikan,
Wêneyan, têbînîyên reş
Wêneyê xwe yê bi neynikê ve bixeritîne
Rûne
Bi jiyana xwe şa bibe

Wergera ji îngilîzî: Jaff



Institut kurde de Paris



Marianne Davidson, 74 salî

Marit Kapla (1970 -)

Malpereke înternetê bû

Xebatkara pirtûkxanê li Simrishamnê Asta
ji min re got: divê ez ji wir herim hundir.

Hingê min malpera xwe vekiribû
lê bê wêne
ji ber Simrishamn ne ew qasî mezin e.

Min hema wilo sûretekî xwe danî ser
bi kumekî renggiyayî
ku min rêsa bû.

Sûret ji bo çend saetan xuya kiribû
û min ew rakiribû

Dîsa jî Janne ew dîtibû
û ez nas kiribûm.

Wî ez li vê bazargastîne dîtibûm,
bi vî kumî.

Me berê ji hev re carekê nivîsî
lê wî bi serhişkî berdewam kir

Wî gelek caran dinivîsî û dinivîsî
û min dibersivand.

Ev helbest ji pirtûka Evin bi Swêdî ya Marit Kapla bi destûra wê hatiye wergirtin û wergerandin.
Marit Kapla hemû helbestên di Evin bi Swêdî de li ser belgefilmê Staffan Julén ê bi navê Evin bi Swêdî nivisandiyê.



Min destê xwe emeliyat kiribû
û min nedikarî terka Gladsaxê bikim.

Hingê ew hat derve
û Sigge bi wî re bû.

Ev yek balkêş bû.
Ne tenê Janne herî zêde jî Sigge.

Ew bî bû, mêrbî
û du salan bi tenê jiya.
Ez jî du salan bi tenê jiyam.

Me dest pê kiribû û me hev didît
Bi hev re şîv dixwar
derketina derve ya bi Sigge re
û pêkanîna hindêk tiştan.

Ev ne tiştêkî ew qasî xweş e
ku meriv timî here cihnan
û bi tena serê xwe bimîne.

Di wan demên ez bi tenê diimam de
ku ev sê dembeş in
ez xwedî jiyaneke dercivakî bûm.

Ev tiştêkî wilo ye ku mirov tenê dikare
Li dora maseyekê
bibe xwedî çend kursiyên cohejmar:
Lê mirov nikare bibe
xwediyê hejmareke fer.

Ma mirov derdikeve derve dema ku mirov bi tenê be?
Ma hemû mêrên li wir
bi destûr hatine wir?



Ez tenê carekê hatibûm vexwendin
Dema ku hejmareke fer a mirovan
û mirovên ji curetêkiliyên cuda
li wir hebûn

Jiyan piredetî ye:
Li gorî ku divê mirov
du û du bin hatiye saz kirin;
te divê mirov çendîn şa bin yan jî neşa bin.

Û ha wilo wî carekê dest ji min berdabû.

Em li bazara Kivixsê bûn.

Ez li wir bûm û min firoşkarî dikir
û kêfa min xweş bû

Wî jî firoşkarî dikir li bazara Kivixsê.
Ew pirtûkfiroş e.

Ew ê hingê bibûya alîkar
ji bo vekirina dezgehê bazarê û çenebû.

Û min gelekî baş dizanîbû bê çawa vedibe.
Dotira rojê ew nema hat.

Dotira wê rojê
wî telefon kir û got
ku Sigge gelek ji wî hêrs bûye.

Wergera ji swêdî: Serkan Birûsk



Min gelek ji wan dît - J'en ai vu plusieurs

Jacques Prévert (1900-1977)

Min kesek dît ku li ser kumê kesekî din rûniştî bû

Zerhimî bû

Dilerizî

Li hêviya tiştêkî bû... ne xem e çi bû...

Ceng... dawiya dinyayê...

Wî hîç nedikarî bilive yan biaxive

û kesê din ê ku li kum (ê xwe) digeriya

Hîn zerhimîtir bû

Û ew jî dilerizî û her ev dubare dikir, kumê min... kumê min...

Û dilê wî û girî hebû

Min kesek dît ku rojname dixwendin min kesek dît ku sîlav li alayê dikir

min kesekî reşpoş dît

Wî saetek hebû û zincîra saetê û cuzdaneke pereyan û madalyaya rûmetê û berçavkek

Min kesek dît ku destê kurê xwe dikişkişand û diqîriya

Min kesek li gel kûçikekî dît

Min kesek li gel gopalşûrekî dît

Min kesekî ku digiriya dît

Min kesekî ku derbasî kinîştê dibû

Û kesekî ku ji kinîştê derdiket dît...

Wergera ji fransî: **Îbrahîm Xelîl**



Ez bi zimanê cîhanê axivîm - Ik heb de wereldtaal gesproken

Hans Andreus (1926-1977)

Ez bi zimanê cîhanê axivîm
û bi zimanê gulover ê dinyayê
û bi zimanê rojê û bi zimanê heyvê
û bi zimanê ajalan

Min ji mermer peyker çêkirin
û min agirekî sor vêxist
min nefes da û stend bi muzîkê
û min li ser kaxeza nerm a rûnkirî xêz çêkir

Lê tiştê ku ji min hat ew bû
ji bilî çermê min û destên min
ji bilî korbûna devê min
û deştên çavên min

Ji ber ku tu dikarî li deverekê hatibî dîtin
di lîstika razdar a di tîpan de
di nava wergera peyvan de
û di cîhana mûcîzeyî ya ziman de

Wergera ji holandî: Hebhinarkê

Min fala destan xwend
û min stêrk texmîn kirin
min zêr afirand ji kevir
û min xewn berovajî şirove kirin

Tu tişt, tu tişt ne bes bû
peyv şikestin wekî pêlan
li ser lêvên te yên kovî
û li ser çavên te yên ji hundirê dinyayê

Û ez niha ji te dipirsim guhdarî bike
wekî tu radiwestî û li çivîkan guhdarî dikî
wekî tu radiwestî û li rojê mêze dikî
wekî tu min mist didî di hembêza xwe de

Ez bi zimanê cîhanê axivîm
û bi zimanê gulover ê dinyayê
û bi zimanê rojê û bi zimanê heyvê
û bi zimanê ajalan



Hesp - Caballos

Pablo Neruda (1904-1973)

Min ji pencereyê hesp dîtîn.

Zivistanê, li Berlînê bûm.
Şemal bê şewq, asîman bê asîman bû.

Hewa çîlspî mîna nanekî şil.

Û ji pencereya min ve meydana xalî
ku bi diranên zivistanê hatiye cûtîn.


Ji nişkê ve,
merivekî deh hesp ajotin nava mijê.

Bi dijarî pêşda hilperîn wekî alav,
lê li ber çavên min zêdetir dagirtin hemû cîhan
a ku vala bû heta wê gavê. Bêqusûr, bi şewq û şemal
ew mîna deh Xwedayên bi simên spî saf
û bijiyên mîna xeyaleke ji xwê.

Hêtên wan rûzemînî û torincî.

Rengên wan hingivîni, kehrîbar û alavî.

Gerdenên wan wekî bircan bû
qut dibûn ji kevirê bi îhtîşam
û li pişt çavên wan ên şefafî
hêz har bû mînanî girtiyekî.



Institut Kurde de Paris



Û li wir, li bêdengiyê, li nava wê rojê
wê tariyê, zivistana bi qîr û qerpal
di rakêşa hespan de xwîn û rîtmek,
kelecana kana jiyane hebû.

Min lê nêrî, min lê nêrî
û bêyî ku pê bizanibe ji nû ve zabû
li wir, li wir bû kanîzil, ew reqsa zêrîn
ew asîman, ew agirê ku vejyabû di bedewiyê de.

Min ji bîr kir ew zivistana Berlîna tarî.

Lê ez ê tu car ji bîr nekim şemala wan hespan.

Wergera ji îspanyolî: Mem Alan

Institut kurde de Paris



Ramedîna li hemberî deryayê - Deitado frente ao mar

Celso Emilio Ferreiro Miguez (1912-1979)

Zimanê proleter ê gelê min
Bi wî diaxifim ji ber ku erê, ji ber ku ez jê hez dikim,
Ji ber ku dilê min wisa dikişîne, wisa dixwaze, wisa hîs dikim;
Ji ber ku ev ji hundirê min tê, ji kûrahiya
Xemgîniyeke asîdî tê ku min diherikîne.
Dema ku ez gelek ehmeqên derbider,
Mendebûrên piçûk ên bêesil dibînim
Dema ku qerewatên xwe dikin stûyê xwe êdî nizanin
Qedr û qîmetên bav û kalan,
Naaxifin bi zimanê dayikan,
Bi zimanê pîrikên mirî,
Nabin wekî deryavan û cotkarên şanaz
Ên ku her demê bi zimanê xwe diaxivîn
Wekî karkerên zimên.
Bi wî diaxifim ji ber ku erê, ji ber ku ez jê hez dikim
Û dixwazim bi yê xwe re bim, bi xelkê xwe re
Nêzîkî wan însanên qenc bim ewên ku êşeke dirêj dikişînin
Ji ber ku dîroka wan bi zimanekî din ve tê vegotin.

Ez ji bo pozbilindan napeyivim,
Ji bo nebaş û zordaran napeyivim,
Ji bo qurreyan napeyivim,
Ji bo bûdelayan napeyivim,
Ji bo betalan napeyivim,
Ez ji bo wan kesên ku bi hêz li dijî
Derew û neheqiyên bêdawî li ber xwe didin dipeyivim;
Ji bo kesên ku xwêdanê dirêjin û bi çavên rût
Qêrîna rojane ya perperokan, ya agir û ya bayê dibînin, dipeyivim.

Ez nikarim peyvên xwe dûr bixim
Ji wan hemû kesên ku li vê dinyayê êşe dikişînin.
Û tu li vî dinyayê dijî, axa min,
Dergûşa nijada min, Galîsya! êşa şîrîn a Îspanyayan,
Ew rêya ku li ber deryayê dirêj dibe...

1962

Wergera ji galîsyanî: Ûrfan Kenî



“Hêvî” ew tişt a bi perrîk e - Hope is the thing with feathers

Emily Dickinson (1830-1886)

“Hêvî” ew tişt a bi perrîk e -

Ku li ser giyên vedinişe -

Û newaya bê gotin dixwîne -

Û qet ranaweste -qet -

Û herî şîrîn -di Ziryane de- tê bihîstin -

Û divê gurr be ew bahoz -

Ku bikaribe deng bibirre ji wê Çivîka biçûk -

A ku germ dike gelek mirovan -

Min ew li welatê herî sar bihîst -

Û li Deryaya herî seyr -

Lê -qet- di Cewr û Cefayan de jî,

Hûrikek nê nexwest -ji min.

Wergera ji îngilîzî: Aydin Ekîn

Institut kurde de Paris



Stran bo bizavkirinê - Lied zur Ermutigung

Hilde Domin (1909 - 2006)

Demeke dirêj tu hatî nêçîrkin ji derdora dîwarên
bêderî yên bajêr.
Tu direvî û direşînî navên şaşmayî yên tiştan li pey xwe
Bawerî, ev e ABCya herî dijwar.
Nîşaneyeke biçûk çêdikim li asîmên,
heşîf, li wê devera ku bajarê nû dest pê dike,
Jarusalem.
Ew zêrîna
ne ji tu tiştî.

Wergera ji almanî: Yasemîn Acer

**Awaza kevir
Shirin Razavian**

Awayê ruhê dêrîn ê kevir
ji dûrahiya şeşsed mîlyon salên kevnar ve
li neya li ser lêvên hindiyên sor guhdar dikim

Li wir, li cihê ku zemîn
bi çîrokên xwe yên ji çendîn hezar salan ve
rûdine

Bi kubariya volkanekê vemirî
û bi ruhekî bêdeng
dixwaze bibihîze ku pistepista wî
ji devê her kevirêkî
her giyayekê, striyekî û zinarekî ve hatiye bihîstin

Wergera ji farisî: Ebas Mûsa



Wekî mirinê

Hayk Zohrabyan

Wekî mirina zelûl, ruhê min wêran e,
û ramanên vala min dilhinavkutokî dîkin.
Lê her tişt dibe xewn,
Kîngê ku gavên min min tînin ber mala te.

Wê tu berjêr dibî mînanî kewekê
Porê te nam, ken li ser dêmê,
Nêrîna te zelal mînanî ya Xwedê,
Ji min ra namîne bêjim tu tiştê.

Her tenê bi lêvên te ye terikî biketama,
Li ser sînga te ye vekirî dîsa kelogirî bibûma,
Û min binax bikira azara giyanê xwe
Bi bêhna canê te... hem îro... û sibe...

Wekî mirina zelûl, ruhê min wêran e,
û ramanên vala min dilhinavkutokî dîkin
Lê her tişt dibe xewn,
Kîngê ku gavên min min tînin ber mala te.

Wergera ji ermenî: **Seyrana Celad**



Di dema barana zîvîn de - In time of silver rain

Langston Hughes (1901 - 1967)


Di dema barana zîvîn de
Car din xak jiyaneke nû pêşkêş dike,
Zûrçikên kesk şîn tên
Û kulîlk serê xwe hildidin,
Li seranserî newalê
Mûcîzeyek belav dibe

Ji jiyane,
Ji jiyane,
Ji jiyane!

Di dema barana zîvîn de
Perperrîk perrên xwe yên hevrîşim radikin
Ji bo ku giriyê qozeqerekê werbigirin
Dar pelên nû pêşkêş dikin
Da stranan bibêjin
Bi kêfxweşî di bin asîmanekî de
Gava lawik xwe ji rê berdidin
Keç jî tên stranan dibêjin,

Di dema barana zîvîn de gava bihar
Û jiyane
Nû dibedile.

Wergera ji îngilîzî: Azad Rêbiwar



Institut kurde de Paris



Baxçe - Le jardin

Jacques Prévert (1900 - 1977)

Wê hezar û bi hezaran sal
têrê nekin
bo vegotina wê kêlîka biçûk a herhebûnê
ku te ez maç kîrim
ku min tu maç kîr
li sibeheke di ronahiya zivistanê de
li parqa Montsourîsê li Parîsê
Li Parîsê
Li ser rûerdê
Ew erda ku stêrek e.

Wergera ji fransî: Kevokê

Institut kurde de Paris

Baxçe - Le jardin

Jacques Prévert (1900-1977)

Hezar û bi hezaran sal
têra derbirîna
wê kêliya kurt î bêpayan nakin
Wê kêliya ku te'z maçî kîrim
û ku min tu maçî kîr
li sibeheke di ronkahiya zivistanê de
li Parîsê li parqa Montsourîsê
Li Parîsê
li rûbarê dinyayê
Li rûbarê ku lap stêrek e.

Wergera ji fransî: Yeqîn h.



Qereçiyê sernixumandî

Mihemed El Maxût

Bêyî ku li demjimêra dîwêr
Yan li lînûsa berîkê binêrim
Bi demên qêrînên xwe dizanim.
Li rêyan şêr bûme
Silavê didim vî û xêtir ji yê din dixwazim
Bi dizî li berbanên bilind dinêrim
Li wan şûnan dinêrim, ên ku ta neynûk û diranên min jî dê di şoreşên dahatûyê de bigihêne
Nexwe ez jixweber tûşî birçîbûnê nebûme
Ne jî ji kêfê yan ji bêsûciyê bûm derbider
“Simbilek di dîrokê de tune ye ku gilêza min li ser tune be”

Ez dizanim siberoja min tarî ye
Û qîlên min find in
Ez dizanim tûjîya nêr dê wekî tûjîya xencerekê be
Û wê rojekê çemê birçîyan
Bi keştiyên xwe yên xwînî
Û bi hêzên xwe yên tozgirtî biherike
Ez pêxemberek im ku ji rî, gopal û beyabanê pê ve tiştêk ji min kêr tune ye
Lê dîsa jî ez ê bimînim û di “Hevirê Qadîsiyê” de
û di “Şorbeya Waterloo” de gazînan li çekê bikim, ewa ku cîhan di bikaranîna wê de
mijûl e
Xwedê ez wiha dame
Keştî û bahoz
Daristan û êzingvan
Çermreşîkekî pirreng im, mîna berbangê, mîna biharê
Di xwîna min de semaya waltzê
Û di hestiyên min de velorîna kerbelayê heye

Heta ku tûtîn, çixat û cade hebin
Wê tu hêz li dinyayê nikanibin min neçar bikin ku tiştê ez jê hez nakim, jê hez bikim û
tiştê ez nefret nakim, jê nefret bikim...

Wergera ji erebî: Cansoz Dabo



Dara Axlemûrê - Der Lindenbaum

Wilhelm Muller

Li ber kaniya l'ber dêrî
Ha ye dareke Axlemûrê
Dikevim xeyalan xeyaline şêrîn
Ez li binê siya wê

Diterêşim li ser qaşilê wê
Hin peyvîne dilvîn;
Di şadî û xemê de
Her li wê û li min

Divê îro jî bigeriyama
D'nava kûrahiya şevê de
Ha li wir di tariyê de hêj
Min girtin çavêd xwe

Û kirin xuşexuş şaxêd wê
Weku l'min bikin bang e;
"Were ba min Rêwiyo,
Tê li vir bibînî aramiya xwe!"

Rabûn bayêd sar
Xwe l'nava rûyê min dan
Firrî ji serê min kum
Min xwe tev neda.

Baş e çend saetekan ez
dûr ji wê derê
Û dibihîzim tim wê xuşexuşê:
Tê l'wir bibînî Aramiyê!

Wergera ji almanî: Hoşeng Nizarî




Lê belê belkî - Aber vielleicht

Erich Fried

Peyvên min ên mezin
wê min ji mirinê neparêzin
û peyvên min ên biçûk
wê min ji mirinê neparêzin
ne tu peyv
û ne jî bêdengiya dî navbera
wan peyvên biçûk û mezin de
wê nikaribe min ji mirinê biparêze

Lê belê belkî
hinek
ji van peyvan
û belkî
bi taybetî yên biçûktir
yan jî bi tenê bêdengiya
dî navbera peyvan de
hinekan ji mirinê biparêze
gava ku ez mirî bim

Wergera ji almanî: Asya Xerzan



Institut kurde de Paris



Du kes bûn

Riyad Salih Hisên (1954 - 1982)

Du kes bûn
Dimeşîyan
Di kolanên bêkes re
Ji wî bêhna tûtîne dihat
Ji wê jî pelên leymûnan diweşîyan
Û di zîvraneke de
Mîna du stêrkan
Hilweşîyan

Du kes bûn
Yekî ji wan distira
Ya din ji guhdariyê hez dikir
Bi carekê re rawestîyan
Dema ku bilûr şikest
Du kes bûn
Wê pênûsek diyarî wî kir ji bo nivisandîne
Wî jî pêlaveke sivik ji bo gerê

Bi pênûsê jê re got bi xatirê te
Wê jî bi pêlava sivik xatir jê xwest

Wergera ji erebî: Rizoyê Xerzî



Ez dixwazim werim malê hembêza te - Jeg vil hjem til ditt favntak

Astrid Hjertenæs Andersen (1915 - 1985)

Ez dixwazim werim malê hembêza te
Dema piyanoya wekî qeşayê dest pê dike lê dixe
Dixwazim bibînim ku dilê te lê dixe bi dilê min re
Bi teqla baskên teyrên xurt ên ji êgir
Li ser girên berbanga sibehê yên boz û şîn

Ez dixwazim hilma te ya germ hest bikim
Dema ku darên tazî yên kesteneyan xwe dispêrin stûyê min
Bi nazikî bang li asîmên dîkin
Dixwazim tu min bigerînin
Li ser rêyên birqokî yên bi pelên sor û reş

Tu min li ser xetan dihejînin
Bi gulên cotmehê ku hîna jî bi rengan xemilî ne
Tu min mecbûr dikî ku ez dîsa te bibînim
Kûr di vî baxçeyê payîzkî de
Ku li wir darên zivistanê fêkiyên geş didin.

Wergera ji norwecî: **Salih Agir Qoserî**




Kwêrêk

Jorge Luis Borges (1899-1986)

Nazanîm çî rûxsarêk lêm derriwanê,
katêk derriwanîme rûxsarî awêneke;
nazanîm çî pîrepiyawêk kewtuwete bosey wênedanewekey,
bewperrî matî û şeketîyewe.
kwêrekwêr, le naw sêberkem, pel dekutim,
hellweday hawşêwe nadiyarekanmim.
Brûskeyek be bîlbîlemda heldeçeçê,
egrîcete; xollemêşîye yaxud her zerde.
Deyllêmewe: min tenya rûkeşî bêbayexî şitekanîm le kîs çuwe.
Sa Milton behêze û xemrrewênme,
bellam min bîr le gullebax û pîtekan dekemewe.
Dehizîrm ger bîmtwanîbaye rûxsarm bibînme,
bem êware namoye demzanî min kê.

Wergêranî le îspaniyewe: Jiyar Homer





Sê pifdankên sabûnê

Alberto Caeiro*

I

Ger min karîbûya bi temamî dev li erdê bikira û bi tama wê bihisiyama,
ger erd tiştekek bûya ku bihata gezkirin ez ê kêlîkekê kêfxweştir bûma...

Belam ne ku her gavê jî kêfxweşiyê dixwazim.

Divê carinan ne kêfxweş bim,

heyani karibim xweristî bim...

Dinya timî ne rojên bi tav in,

gava ku baran kêmpayda dibe, bêtir tê xwestin.

Lema ku kêfxweşî û perîşaniyê fena

Du tiştên xweristî dibînim,

eyn weku çawa yek li hebûna çiya, deşt, giya û hîman ecêbmayî namîne...

Tiştên ku birra ji me kêm e,

ew e ku em di kêfxweşî û perîşaniyê de bêhnfireh û asayî bin,

em bi tiştan bihisin weku em wan dibînin

em bifikirin weku em dimeşin,

û gava ku wexta mirinê bê, divê bê bîra me ku roj jî dimire

û hingur jî bedew e

û her wiha şeva ku ji ber dimîne jî...

Û eger diviya ku ev yek wilo be, ew jî ji ber ku diviyabû wilo be.

* Alberto Caeiro yek ji navdartirîn heteronomên Fernando Pessoa ye.



II

Pifdankên sabûnê yên ku niha ev lawikê han bi çêkirina wan şa dibe,
bi zelalî cihê felsefeyeke dirust dinimîne
Pifdankine zelal, bêkêr û wekî xwezayê jî rêwî,
Pifdankine ku wekî tiştan hevalên çavan in
ew wilo ne
wekî xwe ne
bi bêkêmasiyeke girover û hewayî,
û ne kesek jî,
heya bi wî zarokê ku wan pif dide jî hewl nade ku ew zêdetirî xuyanga xwe bixuyin.
hinek ji wan bi zorê di hewayaya sayî re tîn dîtin,
wekî surra bayê hênîk in ku bi gobilîna xwe re bi zorê kulîlkan radipelîne,
bayê ku niha, tenê em dizanin ku wa ye dibore
ji ber ku tiştêk di nava me de sivik dibe
îcar bi zelalî her tiştê dî qebûl dike.

III

Xwezka toza li ser rêyan bûma
bi nigên xwe yên xwas hejaran pê li min bikira...
Xwezka çemên herikandî bûma
Li delavên min jinên çîşo belakirî bûyana.
Xwezka spîndarên devên çeman bûma.
Û ji bilî asîman li jora min û ji bilî avê li jêra min hîç tu tiştêkî min ê dî tune bûya.
Xwezka ez kerê qerraş bûma
Û wî ez bi çoco û qamçiyên bixwestama.
Xwezka berî gişî jî ez ew bûma ewê ku dinya derbas kiriye
Bi rê ve diçe û diêşe
Li pişt xwe dinêre û diêşe.

Wergera ji almanî: Ciwan Qado



Ez şev im - Ich bin die Nacht

Selma Meerbaum (1924-1942)

Ez şev im. Berrûkên min
pir nermtir in, ji mirina Spî.
Ez ê her tayeke germ
dî gel xwe bibim nava keştiya xwe ya sar û tarî.

Evîndarê min î rêya dirêj
Hetahetayê em pêkve bend in
Ez jê hez dikim û wî bi porê xwe yê
hevrişim î nerm dinixumînim.

Ramûsana min şîrîn e mîna bêhna lale-
Ê rêwing wê baş dinase...
dema xwe di hembêza min werdike,
Her jineke germik ji bîr dike.

Destên min î pir zirav û spî,
her tayeke sar dikin
her eniya ku bihingivinê,
divêt bêyî vîna xwe bigirnin.

Ez şev im. Berrûkên min
pir nermtir in, ji mirina Spî.
Ez ê her tayeke germ
dî gel xwe bibim nava keştiya xwe ya sar û tarî.

Wergera ji almanî: Tengezar Marînî



Bihar - Frühling

Selma Meerbaum-Eisinger (1924-1942)

Tav. Û hinekî din berfa heliyayî
û av ji her banekî diherike,
û paşê paniyeke pêxwas dikute,
û kolanên ku di şiliya hilû de dibiriqin,
û giya li pişt têlên bilind şîn dibe
sekiniye li wir wekî xezaleke bizdandî...

Asîman. Û baran nermtir germtir dibare
û paşê kûçikek diwete belasebeb,
Mantoyekî vekirî diperpîte,
cilekî tenik daleqandî mîna ken,
piçek berfa şil di destê zarokê de
û di çavan de bendewariya nefela yekem -

Bihar. Dar niha rût û tazî ne
û her devî mîna dengê nerm e
wekî yekem xebera bextewariya nû,
Û sibe dê hehecik jî vegerin.

Wergera ji almanî: Nûwar



Şêst salan bi şûn de - Sixty years after

Derek Walcott (1930 - 2017)

Ji çerxekursiya xwe ve di salona Virginê de li Vieuxfortê,
min dît,
ew jî di çerxekursiya xwe de rûniştiye,
bedewiya wê piştixûz e mîna kulîlkeke tepisî,
ewa ku ji min bû ew agirê xortaniya min e
û dîkir ku bi erka xwe rabûya da hetahetayê rindik û canik û zêrîn bimaya
heta di ber kalbûna min re jî.
Êdî çene lê bûye sêqorî,
bûye pîr, gîrnîja wê ya wêran ketiye xefka qermîçokan,
lê belê ez pê hesiyam ku tagermî dîsa bêhnekê vedigeriya
hîngî em li wira rûniştibûn, seqet, ruhê me ji demê û ji gotinên giştî yên xweşbêş diçû.

Pêline biçûk hîn li îskeleya kêvir a biçûk dişikiyan
ciyê ku qayikvanekî li nava aştiya narincî ya hingurê ez peya kirim,
nîvsedsal berê,
ya wê, belkî ew dilşatir bû wergî şipyayî,
askek bû bi şermîna xwe,
ez jî bi dû bicîkirina evîneke nepêkan ketibûm;
yên em nas dikirin pak pê dizanîn ku tu carê em pevra nabin,
qe nebe şipyayî.

A niha jî kêrên bêdeng ji danûstandina hundirîn di me re borîn.

Wergera ji îngilîzî: Azad Ekkaş

* Vieuxfort: Bajarokê li başûrî girava Saint Lucia ye.



Phoenix

Evdilwehab Elbeyatî (1926 - 1999)

Jê hez dikim keça nûhatî
Sax an mirî
Helbestek li ser kêlegorekê, hozanyariyeke kevnar
Serwayeke sêwî
Sefsafeke bêpel î tazî
Li tenîştta feratê digirî
- Min jê hez kir berî ku wî bibînim
Berî ku destên wî rahêjin min û bigerînin li aranên welatê min
Li dû ku ji min hez kir, evîndariya wî ez şewitandim
Di giyanê min de hêza tiştan peyda bû
Û zivistan bi paş ket
Berfa tenahiyê dawerivî
Zaroktiya min hişyar bû
Bi çêja şewatê, di devê min de xwîn û arî
Û dema ez maçî kirim, min hest pê kir ku zemîn du caran geriya, baran bariya
Porberdayî li daristanê beziyam
Li daristana remilzaniyê
Ba pif dida sînga min wekî babirrkeke li ser çem
Memikên min bi tirs bûn û ez bi bêsûciya zarokên bêsûc dikeniyam
Min jê re got, were loo!
Tu jîna min î, tu yê min î, were
Bidirîn û bidirîn vê perdê
Û tarîtiya min bi henûniya êgir vemirîne
Rojekê ji rojan ji min re got... axx
Min ji bîr kir ku mirî van hawaran nabihîzin
- Kesek ji min re nema
Tev mirin, koç kirin, oxir kevoka min e!
Me bi hev re dizanîbû bi sirra mirinê û jiyane
Em bi hev re bûn, îcarê ax!
...Şev bi ser Madrîdê de hat
Û qeşa ket
Bi destê xwe yê spî rûyê evîndarê beradayî veşart
Û kevok firriya
Û termê min li Tihamayê* vegeheriya

* Tihama ew herêm e ku bajarê Meke lê ye.




Û dema min çavên xwe vekirin, xumam bû
Girtibû rûyê miriyê ku vegeyriyaye bi maçan
Bi desmalê paqij dike hêsirên wî
Û tilûriya çûkekî nenas
Bi şev difirriya, min helbestkarê Almearayê* dît
Tewafa malê dikir
Rû melûl û mirî
Min got xortaniya min li benda wê wenda bû, bersiv da
Tu carê nepirse
Çiyayê Altubadê** bersivê nade
Yên li bersivan digerin
Min got xortaniya min li ser goran wenda bû
Û pirtûkên zer û hibirdank
Ji welatekî ta bi welatekî koçber
Ez li hemû çayxaneyên dinyaya mezin li bendê mam
Min digot ez ê rojekê wê bibînim lê ez şaş bûm
Tirkên demjimêrê tikiyan, û bê hesab jiyana min xwarin
Got, bi hêvî be... Û çû
Şêxê Almearayê kor derî girtin
- Min jê hez kir, îcarê mir
Roja jiyana min çû ava
Hey dara arakê
Va ye ez ji erşê mirinê vedigerim binemaliyê
Li rehên wê li vê arana fireh digerin
...Û stêrk geriyar
Û ez hîn li Tihamayê digerin
li wê kevokê
Û li şeva ku periyekê serdana min kir
Heyv danî ser eniya min, û sînga min qelaşt, dilê min deranî
Jê derxist liba reş
Û ji min re got ji Phoenix dûr bikeve
Eger hat girtin pîr dibe
De îcarê vegere ser goran
Û pirtûkên zer û hibirdank
Ji welatekî ta bi welatekî koçber

Wergera ji erebî: Alan Hemo

* Almeara bajarê helbestkar ê serdema Ebasî Ebû Elaa Almeari.

** Altubad çiyayekî li Erebiştana Siudî ye ku bûyera hezkirina Qeys û Leyla lê boriye.



Berga çapa ewil a pirtûka Baudelaire
 "Kulîlkên Xerabiyê/Les Fleurs Du Mal", tevî destxetên wî.
 Sal 1857

